

## Gelawêj bêhna Kurdan ji bo serxwebûnê fireh dike

»»» R:7




## Kurtiyek ji Jiyan û Xebata Pêşewa Qazî Mihemed

»»» R:4



## Lûtkeya germahiyê

»»» R:2



## Girtî bi darê zorê teslîm nedibûn

»»» R:6



## PDKÎ li ser koka demokrasiyê şîn bûye

»»» R:8




*Bidestveanîna mafên neteweî yên gelê kurd di çarçoveya Îraneke demokratîk û federal de*

# Agirî

*Duheftînameyek Siayasî-Giştî Ye, PDK Îranê diweşîne www.kurdistanmedia.com/kurdî*

*www.agirimedia.org Hejmar (355) 06-08-2019 Buha (1000) Tûmen*

# Cemaran serşorane paşekêşê dike



**Roja Sêşemiyê 15-ê Gelawêjê serkomarê rejîma Îranê di civînekê de, di avahiya Wezareta Derve de, derheq komeke pirsên têkildar bi Îranê û ji wan jî, tehrîmên Amerîkayê, ewlehiya avên kendawê, hatina nawganên Amerîkayî bo kendawê, û pirsa “Bercam”ê axivî, ku di beşeke axavtina xwe de bi niqurçkgirtin (tanelêdan, tewnlêdan) îşare bi vegeriyaneke şermzarane di demeke nêz de, ji aliyê Komara Îslamiya Îranê ve kir.**

Hesen Rûhanî tevî vê ku îdia kiriye ku kariye ji riya dezgehên dîplomasiyê ve! Amerîkayê bo du caran di asta siyaseta cîhanî de tenê bihêle, û ew yek wekî deskewteke girîng ya dewleta xwe bi nav kir, bi zimanê amajeyê, tevî gefxwarina li Amerîkayê û hevpeymanan ragehand: “Aştî digel Îranê diya hemû aştiyan e, û şerkirina digel dayka hemû şeran!”.

Navbirî bi gefxwarina li Amerîka û hevalbendên wî ragehandiye: “Ketina nava metirsiyan de ya ewlehiya Îranê, bi wateya ketina ewlehiya wan bixweye”, û rû li Amerîkayê jî gotiye: “Hûn nikarin ewlehiya me têk bidin, lê dibe hûn agehdarî ewlehiya serbazên xwe bin! aştî li hember aştî, şer li hember şer, neft li hember neft, ewlehî li hembe ewlehiyê de”.

Hevdem digel van axavtinan ku bi zimanê gefan encam dane, navbirî nekariye tirsa dezgeha Wilayetî jî di siberoja wan ya nexûya de veşêre, û ragehand: “Heta hekî Amerîka jî amade nebe ku vegere nava rêkkevtina navikî de, eva em bi bê merc her amade ne bo gotûbêjan”. Ew yek jî tê wateya paşvekêşaneke serşorane ji wan helwetsên ku berî tehrîmkirina Zerîf xwe nîşan dida!.

Roja Çarşemiyê rêkewt 9-ê Gelawêjê Wezareta Xizînedariya Amerîkayê bi awayekî fermî Mihemed Cewad Zerîf Wezîrê Derve ê rejîma Îranê jî xiste nava lîsta dorpêçên xwe de, ku ew pêngav di çarçoweya siyaseta “zêdetirîn zext” û bi armanca daxistina dezgeha bi nav dîplomasiya Komara Îslamî de.
Ya ku di bûyerên çend hefteyên borî de bi zeqî xwe nîşan da, pêk tê ji vê ku, Komara Îslamiya Îranê mijûlî “xendiqandina masiyan” e!. Komara Îslamiya Îranê di bin zexta navdewletî de, û bi taybetî tehrîmên siyasî û aborî ên Amerîkayê de, ku rohn e têçûyeke wisa jî bo Amerîkayê nîne, ketiye bin zexteke bêmînak de, ku nefes lê birriye, lewra jî Elî Xamineyî tenê bi şert û mercê mana xwe amade ye her karekî bike, heta rêkkewtin digel “şeytanê mezin!”. Axavtinên îro ên Ruhanî jî her di vê çarêçoweyê de xwe nîşan didin”.

## Sergotar

### Lûtkeya germahiyê


N: Kerîm Perwîzî

15-ê Gelawêjê li gora hesaba hejmarê, dibe nîveka havînê, û li gor stêrknasiya Kurdî dema derketina stêrka Gelawêjê ye ku germahiya havînê di lûtkeya xwe de ye, û piştre êdî ber bi hênikatiyê ve diçe.

Germahiya xwezayê di dîroka siyasî ya Kurd de berevajiyê germahiya siyasetê bûye. Rast wekî tu bêjî ka çiyayeke bilind eksê wê ketibe nava deryayeke rex çiya. Lûtkeya çiya di nava avê de xala herî kûr e, û daketina ji çiya, û vajmaniya wê (zayeleya wê, in`ikasa wê) di nava avê de hilkişiyan e ber bi bilindahiyê!.
Sala 1324-an a Rojî di dema daketina germaya havînê de, siyaseta Kurdistanê ber bi jor hilkişiya, û di 25-ê Gelawêjê de Pêşewayê Kurd PDKÎ ava kir, û her çi germahiya xwezayê kêmtir dibû, germahiya siyaseta Kurdistanê zortir û zortir difûra û kel diçû, û çalakiyên PDKÎ zêdetir dibûn, û di mehên dawiyê de, Hêza Pêşmerge ava kir, û dawî şûnwarê leşkerî li Mehabadê de ji nav bir. Rast 159 rojan piştî avakirina PDKÎ û şeş mehan piştî lûtkeya germahiya havînê di lûtkeya sermaya xwezayê de germahiya siyasetê a Kurdistanê gihîşte lûtkeya xwe û Komara Kurdistanê hate avakirin.

Em di sala 1398-an de ne, û 15-ê Gelawêjê hat û germahiya xwezayê gihîşte lûtkeyê, û ji niha şûnda berew serê hildikşe. Hêma û nîşanên siyasetê li Îranê û li Kurdistanê de dibêjne me ku berevajiyê rewta germahiya xwezayê, germahiya siyasetê rû li hilkişanê ye.
Komara Îslamiya Îranê dixwaze ku sifrên li ser pere rake, ku ew yek nîşaneya hebûna kirîzeke kûr ya aborî ye, û her bîsteke egera teqîna vê kirîzê heye, her di navçe û cîhanê de jî, hêdî-hêdî kêşe û astengiyên Komara Îslamî zêdetir dibin, û di warê nizamî de jî wê tengav dikin, û di biyavê siyasî û dîplomasî de jî kom û civînên siyasî ên zêdetir digre, û hevpêwendiyeke zêdetir li dijî rejîma Tehranê pêk tîne.
Di asta nava Îranê de jî Komara Îslamî mijûlî germkirina bazara bi nav hilbijartina meclisê ye û hemû mohreyên xwe xistine ger da ku hilbijartineke germûgurr jê re bigrin, û rewayiyeke nerewa jê re dest bixin.
Lê vê carê renge ew hilbijartin bi vî awayî ku Komara Îslamî dixwaze jê re neçe serî, belku germaya wê gellek ji vê hindê bitêhntir e ku bixwe hizr dike.
Renge xelk Îranê ew qas tûre bin ji rejîma Îranê, ku ne tenê di hilbijartinê de beşdar nebin, belku kom û civînên hilbijartinê jî bibin hêcet û destpêkek bona birêvebirina meşan û serhildana sertaserî di Îranê de. Renge heta negihîje hilbijartinê jî!
Ew çend mehên bê, kirîzên di Îranê de wê kûrtir bin û digel daketina germahiya xwezayê, siyaset di Îranê de germtir dibe, gelo lûtkeya sermaya xwezayê wê bibe goristana hertimî a Komara Îslamî?

## "Nêçîrvan Barzanî" spasiya Lêpirsyarê Giştî ê Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê kir





**Serokê herêma Kurdistanê di nameyekî de, spas û pêzanînên xwe arasteyê Lêpirsyarê Giştî ê PDKÎ kir.**

Name wiha ye:

Birêz "Mistefa Hicrî"
Lêpirsyarê Giştî ê Partiya Demoktrat a Kurdistana Îran

Silav û rêz
Bi kêfxwaşiye ve peyama pîrozbahiya ve bi boneya hilbijartina min bo serokê herêma Kurdistanê gihîşte me.

Gelek spasê ji ve dikim, hêvîdarim hemû aliyek bikarin bo aramî û berfirehkirina têgihîştin, aştî, bihev re jiyan û pêkve sazîn, di pêxema pêşarojeke baştir de Kar bikin.

Hêviya tendirûstî û bextewerî jibo ve dixwazim.
Her serkevtî bin.
Nêçîrvan Barzanî

## "Qubad Talibanî" Spasa Lêpirsiyarê PDKÎ kir

**Cihgirê Serokwezîrê herêma Kurdistanê, di nameyekî de, spas û pêzanîmên xwe pêşkêşê Lêpirsiyarê Giştî ê Hizba Demokrat a Kurdistana Îranê kir.**

Name wiha ye:

Birêz Lêpirsiyarê Giştî ê Hizba Demokrat a Kurdistana Îranê

Silaveke gerim…

Bi spas ve, pîrozbahîya te gihîşte destê min, em jî di wê kabîneyê de, hêvîdarin bi piştevaniya xelk û hemû aliyên me, piroseya xizmetkirin bi welatiyan re û zîndîkirina herêma Kurdistanê ber bi pêş bibin û hikûmraneke





tendirûst avabikin ku cihê şanaziya hemû aliyeke me be.

Bi dilsozane hewl didin bo parastina û qayîmkirina biratî û yekrêzî dinavbera hemû aliyeke siyasî li pêxema berjiwendiyên xelkê Kurdistanê. Dûbare spasê we dikim û hêviya me ser bilindiya we ye

Digel rêz û hûrmet

Qubad Talibanî

Cihgirê Serokwezîran

## Hey`eteke Yekîtiya Nîştimanî a Kurdistanê serdana Hizba Demokrat kir



**Hey`eteke Yekîtiya Nîştimanî a Kurdistan, serdanê Şivraya Birêveberî a kempa Cêjnîkan a PDKÎ kir.**

Roja Yekşemî 6`ê Gelawêjê, hey`eteke Yekîtiya Nîştiman a Kurdistanê bi serperestiya "Kemal Behrekî" berpirsê komîteya Behrekê a Yekîtiyê, serdanê Şivraya Birêveberî a kempa Cejnîkan a Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê kir.

Ew hey`ete ji aliyê vefdeke Hizbê bi serperestiya "Rehîm Mengûrî", endamê Navenda Siyasî a Hizba Demokrat ve, hate pêşvazîkirin.
Di vê civînê de, herdu aliyan, pirsa Kurd û deverê bi hûrdî niqaş kirin û herwisa wekî du hêzên heval, tekezkirine li ser parastina berjvendiyên neteweyî û bihêzkirina pêwendiyên di navbera herdu aliyan de.

## Dezgeha Pêwendiyên Giştî a Hizba Demokrat, Pîrozbahî li "Mir Hazim Tehsîn Beg" kir

**Dezgeha Pêwendiyên Giştî a PDKÎ, di nameyekê de pîrozbahî li "Mîr Hazim Tehsîn beg" wekî mîrê êzîdiyan kir.**

Name wiha ye:

Digel silav û rêz

Bi navê Dezgeha Pêwendiyên Giştî a Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê ve, pir bi dil Pîrozbahiyê li we dikin ji bo ku bawerî bi we hatiye dayîn. Hêvîdarin ku bi wê hesta we ya bilind di pêxema xizmet bi xweşik û birayên me yê êzîdî bo ser av û axa bav û bapîrên me ve, dawî bi tawankariyên DAÎŞ û neyarên din ê gelê me bînin û serkevtî bin û roleke dîrokî pêk bînin.

Carek din pîrozbahiyê ji we dikin.

Partiya Demokrat a Kurdistana Îran

Dezgeha Pêwendiyên Giştî
Mihemednezîf Qadirî


# Perwerdeya leşkerî a Rêkxistina Eşkere qediya

**Rêkxistana Eşkere a Dezgeha Rêkxistina Giştî a Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê, bi alîkariya Dezgeha Fermandariyê a Hêza Pêşmergeyên Kurdistanê, di rêwresmeke leşkerî a mezin de, dawî li perwerdeya leşkerî a endamên Rêkxistina Eşkere a PDKÎ anî.**

Li gor nûçeya ku gihîştiye malpera "Kurdistanmedia"yê, roja Înê rêkefta 11`ê Gelawêjê, Dezgeha Rêkxistina Giştî a PDKÎ bi alîkariya Fêrgeha Fermandariyê a Hêza Pêşmergeyên Kurdistanê, rêwresmek ji bo dawîbûna perwerdeya leşkerî a Rêkxistina Eşkere a vê partiyê pêk anî.

Rêwresm, bi xwandina marşa netewî a "Ey Reqîp" û xulekek bê dengî ji bo rêzgirtin ji canê paqij ê şehîdên Kurd û Kurdistanê dest pê kir. Pişt re endamên gerra perwerdeyê, sûnda wefadariyê ji bo Kurdistanê, bo rêbaza şehîdan û tevgera mafxwazî a netewa Kurd xwarin û soza xwe ligel rêbaza Demokrat nû kirin.

Beşek ji vê rêwresmê



nimayişa serbazî a desteyên 141, 147, 152, 158 a Hêza Pêşmergeyên Kurdistanê û herwisa desteyên 102, 165, 171 û 188 a Hêza Piştevanî a Pêşmergeyên Kurdistanê bû.

Piştre "Kawe Behramî", berpirsê Dezgeha Fermandariyê a Hêza Pêşmergeyên Kurdistanê, bi vê helkeftê gotarek pêşkêş kir, û di axaftinên xwe de, spasiya Dezgeha Rêkxistina PDKÎ kir ku bi awayekî berfireh ji bo girêdana xebata çiya û bajar kar dikin, û karîne di qonaxa niha a Rasanê de serkeftinê di vî warî de tomar bikin.

Got jî ku Rêkxistina Eşkere a PDKÎ, xwe di warên leşkerî de, ji bo qonaxên pêşerojê ên xebata me amade dike. Navbirî di dawiyê de got, "Hêza Pêşmergeyên Kurdistanê careke din amadeyiya xwe ji bo van erk û xebatan nîşan da ku rêberiya partiya me wê erkdar dike. Di şert û mercên niha de, Hêza Pêşmergeyên Kurdistanê şiyana hemû tevgerên leşkerî û şoreşgerî heye."

Piştre "Dara Natiq", cîgirê Dezgeha Rêkxistina Giştî a PDKÎ, di vê derheqê de, gotarek pêşkêş kir, û bal kişand ser hewl û tekoşîna endamên Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê li navxwe û dervey welat û nemaze li Başûrê Kurdistanê ku bi awayekî berfireh mil bi milê Hêza Pêşmergeyên Kurdistan ji destpêka Rasanê ve xebat û têkoşînê dikin.

"Dara Natiq", berê xwe da endamên eşkere ên PDKÎ û got ku: "Hûn, heman hêz û vîna xwebexş in ku weke baskê bihêz ê Rasanê di van salan de bi hewl, tekoşîn û xebata xwe, bi moraleke bilind tevlî şoreşê bûne." Navbirî di dawiya gotara xwe de ragihand ku "Berî destpêkirina Rasanê, bê dengî bi ser xebata mafxwazî a Kurdan û pirsa Kurd de li Rojhilatê Kurdistanê bibû serdest. Di hevkêşeyên deverê de Kurd hatibûn piştguhxistin, lê bi hewl û tekoşîna we, careke din pirsa Kurd di Rojhilata Navîn de bû pirseke girîng a deverê û we ruhekî nû da bejina tevgera Kurdan."

# Kurtiyek ji Jiyan û Xebata Pêşewa Qazî Mihemed



Di şefeqa 10'ê Xakelêweya sala 1326(30.03.1947)'an de, Pêşewa Qazî Mihemed, Mihemed Hesenxanê Seyfê Qazî (kurmamê Pêşewa) û Ebulqasim Sedrê Qazî (birayê Pêşewa) piştî hukimdanê li du dadgehên ne`adilane û tennê bi nav dadgeh de, bi destê gemar û qirêj yê neyarên gelê Kurd li Çarçira ya bajarê Mehabadê, yanî her li wî cihî de ku li 2'ê Rêbendana 1324(22.01.1946)'an de Komara Kurdistanê tê de hatibû ragihandin, hatne îdamkirin, û her di vê rojê de li ser milê xelkê biemeg û bişeref yê Mehabadê di goristana Mela Camî de hatin veşartin.

Partiya Demokrat ya Kurdistana Îranê li 10'ê Xakelêweya sala 1358(30.03.1979)'an de, ev roje weke Roja Şehîdên Kurdistanê îlan kir, û piştî hiloşîna rejîma Paşatiyê hemû salê di roja han de rêz û hurmet ji şehîdên kurdistanê û pêşengê wan Pêşewa Qazî Mihemed tê girtin.

Qazî Mihemed kurê Qazî Elî yê kurê Mîrza Qasimê Qazî ye. Derbasbûyiya vê malbatê li bajarê Sablaxê vedigere bo 400 salî berî niha.

Qazî Elî bavê Pêşewa, li sala 1930'an li Mehabadê de Rêxistineke kurdî bi navê "Bizava Mihemed" pêk anî. Navhatî tevî şoreşa Şêx Mihemed Xiyabanî di Tewrêzê de têkilî hebû, heta sala 1934'an jî ku koça dawiyê kir, li ser vî karî berdewam bûye. Qazî Elî xwediyê du zarokan bûye, yek ji wan Ebulqasim Qazî naskirî bi Sedrê Qazî bûye ku yek du geran ji aliyê xelkê ve bûye nûnerê Parlemana Îranê, û hitbar û nifûzeke taybetî hebûye. Piştî bidawîhatina dewrana nûnerayetiya xwe, li ser pêşniyara Pêşewa, bo cî bi cî kirina karûbarên siyasî û hevkarî kirin tevî xelkê her li Tehranê mabû.

Qazî Mihemed jî ku di sala 1900'î di vê malbata qedirgiran de ji dayîk bûye, her li destpêka ciwaniya xwe de hizr û hesta nîştimanperweriyê têde xurt bûye, pir hez ji xwendina zanista kevn û taze hebûye û gelek zû di vî warî de xwe pê gehandiye, û gelek cehd kiriye ku zimanên biyanî ji hîn be. Ji bilî zimanê Erebî, Farsî û Kurdî, tevî zimanê Fransî, Îngilîzî û heta qasekê Rûsî jî nasyarî hebûye.

Qazî Mihemed piştî mirina bavê xwe bûye dadwer li bajarê Mehabadê. Li ber hezkirina zaf bi karê çandî û pêşdebirina zanist û agahiya xelkê, di salên beriya sala 1941'an û piştre jî bo yek du salan berpirsyariya îdareya çandê ya bajarê Mehabadê li girtiye stûyê xwe, û xizmeteke zaf ya çandî kiriye. Li dema berpirsyariya wî de, yekemîn xwendingeha keçan li Mehabadê hatiye vekirin. Her di vê derheqê de tevî zaf ji xwendekar, rewşenbîr û mamostayan de pir nêzîkatî hebûye.

Qazî Mihemed rêz û hurmeteke xasmanî ji bo damezirînerên Komeleya J-K (Vejiyana Kurd) hebûye. Di çend salên dewrana bê hikûmetiyê de jî yanî salên 1941-1945'an ku Komara Kurdistanê pêk hatiye, di birêveçûna karûbaran de, û bitaybetî di çareserkirina pirsgirêk û arîşeyên eşîreyan de roleke berçav hebûye. Gelek ji demezirînerên J-K'ê rawêj û hemşêvirî tevî Pêşewa Qazî Mihemed kirine, û gelek jê hez kirine, û zor hewil didan ku ew bibe endamê "J-K"ê. Gelek ji pirs û arîşeyên karî ên rojaneye xelkê li dîwana wî de ku jêre digotin "Mehkeme" dihatne çareser kirin.

Qazî di nava nûnerên welatên biyanî de jî ku wê demê welatê Îranê di navbera xwe de parve kiribûn, rêz û hurmeteke taybetî hebû. Her kes çûye Mehabadê, cehd kiriye berî her kesekê wî bibîne.

Vexwandina wî ji bo Yekîtiya Soviyetê her di vê derheqê de bûye, ku bi şandeke mezin re çûye Bakûyê. Qazî Mihemed ku bû endamê "Komeleya J-K" û navê nepenî yê "Bînayî" jê re hate diyarîkirin, hêviyek zêdetir xiste nav dilê gel de.

Pêşewa Qazî ji ber hurmeteke taybet ku ji bo "J-K"ê hebû, roja avakirina Hizba Demokrata Kurdistanê jî, her li 25'ê Gelawejê, wate li roja avabûna "J-K"ê de îlan kir.

Piştî pêkanîna Kongireya yekemîn, li 2'ê Rêbendana 1324 (30.03.1946)'an de, bi beşdariya nûnerên parçên din ên Kurdistanê û Mela Mistefa Barzanî û Serok Eşîr û nûnerên hemû cih û taxên Kurdistanê, pêkhatina yekemîn Komara Kurdistanê hate îlan kirin.

Ger heta wê demê carna di Rojnameya Kurdistan de qala navê "Pêşewa" dihate kirin, piştî damezirandina Komarê bi awayekî fermî nasnavê "Pêşewa" pê hate bexşîn.

Pêşewa

»»»Dom R:5

»»»Doma R:4

mirovekî gelek bi ferheng, dilsaf, xweşqise, evîndarê wêje û hunerê, ravêjker, di heman demê de miroveke siyasî û demokrat, welatparêz û evîndarê gelê xwe bû.

Qazî Mihemed biratî û hevgirtina Kurdan sedemên herî mezin yên serkeftinê dizanî. Ji ber vê çendê ye ku di piraniya gotar û nivîsarên xwe de ku di rojnameya Kurdistan ya wî çaxî de hatine weşandin, li ser pirsa yekîtî û biratiyê tekez kiriye û wekî merca serkevtin û bingeha ragirtina Komarê û sedemê serkeftina bi ser dujminên gelê Kurd de Bas ji yekgirtinê zaniye.

Her çiqas dizanî ku dujminên gelê Kurd rast nakin, lê di gutûbêjan de gelek bi eşkereyî radigehand ku gelê Kurd hez dike bi awayekî aştiyane bigihîje mafên xwe, lê ger wisa nebe, ewa ji dest bê, dê bike.

Eva hewce bû bi eşkere û bêtirs ji Şah û Qawam re ragihand, tilî li ser kêmasiyên wan li hember gelê Kurd daniye û ji wan re destnîşan kiriye. Bi eşkere jî digot, hûn di gotinên xwe de du dil in û hez nakin pirsa gelê Kurdistanê çareser bikin.

Demekê ku Pêşewa ji aliyê Qewam El Seltene ji bo Tehranê tê vexwandin û di 28'ê Hezîrana 1946'an diçe bo Tehranê, ji aliyên hejmarek ji wezîran, nûnerên Perlemanê û nûnerên Kurdên Tehranê û nûnerên Partiyan û Yekîtiya Karkeran di Balafirgehê de pêşwazî jê hate kirin. Rojnameya "Îranê Ma" (Îrana me) her vê demê dinivîse: Niha ku Qazî Mihemad li Tehranê ye û azadîxwazan ew dîtiye, dê eyan bibe ku hizr û bawera wî pêkanîna azadî û demokrasiyê li gişt Îranê de ye û mafê civakî, siyasî û mirovî ji bo neteweya Kurd di holê de ye. Her karek ku bi qazancê demokrasiyê be, ji aliyê Pêşewayê Kurdistanê ve dê bi can û dil bihê pêşwazî kirin. Em hêvîdarin cenabê Qawam ji vê sefera dîrokî mifahê bistîne.

Di dema xatir xwastinê tevî nemir Mela Mistefa Barzanî de, ew dibêje: "Ez dê xwe gorî û fîdayê gelê xwe bikim û tu demekê weke Pîşewerî û Serokên Azerbaycanê nakim, bona vê ku welatê min bi xwînê sor nebe, û bi hezaran kes nehên kuştin."

Pêşewa û hevalên wî çiqas di heyamê 11 mehên Komarê cehd û bizav kirin, bi wî qasî jî di wan dadgehên rûyekî de ku ji bo mehkeme kirina wan hatibûne li darxistin, fîdakarî û dilêrî ji xwe nîşan dan.

Tevî wan hemû nerehetiyên derûnî û ew jiyana tal û nexweş ku di girtîngeha Padigana Mehabadê de, ji wan re pêk hatibû, ne tenê baweriya wan li dor Kurdayetî û azadiyê lawaz nebibû, belkû gelek bihêztir bibûn.

Wan di hevdîtineke nepenî de tevî yek du mirovên ciyê baweriyê, gotibûn: "Wan em lêbandin, bila gelê Kurd nexape û xebata xwe ji bo rizgarî û serdestiyê bidomînin û çekê nedanên". Her wiha wan gotibû ku deshilatê gelek zext û givaş xistin ser me, hetanî ku em nameyekê ji Mela Mistefa Barzanî re binivîsin ku dest ji xebatê berde. Lê em ne tenê karê wisa nakin, belkû em bawer in eva ji dest wî bihê, divê tevî wan nemêran bike.

Cesûriya wan di dadgehan de bi qasekê bûye ku bibû ciyê ecêbmana Efserên dewletê. Di rastî de Amerîka û Îngilîz jî li pişta vê dadgehê bûn. Her çiqas ji bilî karbidestên wan tu keseke biyanî lê nebûye, lê her ji rêya wan re gelek tişt belav bûne ku hewce dike em bizanin.

Pêşewa her carê di wan du dadgehên leşkerî de, pitir ji çar seetan qise kiriye û bi gotina Serwan Şerîfî ku Parêzerê wî bûye, dibêje: "Eva Qazî Mihemed bû ku hikûmet mehkeme kiriye û di hemû warekê de hikûmet kişandiye jêr pirsyarê".

Rojnameya Azadî ku di wî serdemî de bi zimanê Kurdî li Bexdayê derdiket, derheq piştevaniya Amerîka û Birîtaniya di vê mehkemê de nivîsandibû:

"Îstî'mara Amerîka û Îngilîstanê hebûna Qazî Mihemed û hevalên wî wek tirs û dijminê herî mezin yên xwe dizanîn, û wan hêvî dikirin ku bikarin rêberê Komara Kurdistanê têk bibin. Di girtîngehê de jî nûnerên wan dewletan çun û tevî Pêşewa û hevalên wî qise kirin, bona vê çendê ku bikarin Qazî Mihemed û hevelên wî ji bo aliyê xwe rabikêşin, lê ew çi demekê serkevtî nebûn".

Piştre jî rojnameya Azerbaycan li Bakûyê de nivîsandibû, Qazî Mihemed ji nûnerê Amerîkayê (Curc Alên) re gotibû: "Gelê Kurd li benda tu çakî û hevkariyekê ji aliyê welatên îstî'marî ve nine".

"Necefqulî Pêsyan" axavtinên Pêşewa li dadgehê di çend hevokan de kurt dike û dinivîse: "Li dema dadgehîkirinê de Qazî Mihemad êrîşê dike ser siyaset û kiryarên dewleta Tehranê û digot: "Ez di kuncê girtîngehê de dengê xwe li dijî dewleta Tehranê û serokên wê bilind dikim û dibêjim hûn gunehbar in, ne em, we welatê me dagîr kiriye". Rojnamevaneke din bi navê Silêman.X di nivîsên xwe de dibêje, Qazî got: "Tevahiya wan serpêhatî û bûyerane encama siyaseta dagîrker ya dewletê ye. Ger dewlet hemû Kurdan bi xayîn dizane, bila ji Kurdan vegerin, kar û barên xwe bi xwe bigirne destê xwe".

Di şirove, belge û rojnemeyên Yekîtiya Soviyet a berê de gelek tişt di derbarê vê mijarê de hatine nivîsîn û ji zimanê Efserên Îranê ve bas dikin ku Qazî gotiye: "Ev bûyerane di encama vê çendê de bûye ku we bi xwe Qanûna Bingehîn binpê kiriye. Niha jî ez tenê bi xwe demokrasiyê di Kurdistanê de xurt dikim û pêşde dibim û tu hêzeke biyanî haydarî min nebûye. Bêparbûna gelê Kurd ez ji bo birêvebirina wan kar û xebatan han dam."

Dema ku serokê dadgehê wî bi îxanetkar gunehbar dike, di bersîvê de, Pêşewa dibêje: "Wira mala min e, axa Kurdistanê axa bav û kalên min e, ez çawan dikarim dest ji welatê xwe berdim."

Gera yekemîn a mehkemeyê di 19'ê meha "January" de dest pê kir û çend rojan dom kir û biryara îdama Qaziyan da, û mehkema duyemîn di 28'ê Marsa 1947'an yanî 7'ê Xakelêweyê dest pê kir û roja 30'ê Marsê dawî pê hat.

Kovara Xebata Xwendekaran hejmara 37'an di vê dawiyê de ji zimanê Serwan Kiyûmers Salihî, nûçegihanê Kovara Arteşê ku di dadgehê de bûye û piştre li ser nivîsîna raporekê di vê derheqê de tê girtin û salekê dikeve girtîngehê, çend hevok ji gotinên Pêşewa belav kiriye.

Pêşewa gotiye: "Min ji mêj dem e xwe bo vê yekê amade kiriye, ez bi sîngeke vekirî pêşwaziyê ji vê mirina serbilindane dikim ku di rêya azadiya netewa xwe de tême kuştin. Eva sozek e ku min ji neteweya xwe re daye ku tevî wan bijîm û bo wan jî bimrim, taze ez dê çawa amade bibim peymana xwe bişkînim û binpê bikim."

Her wiha Serwan Kiyûmers dinivîse: "Min di piraniya dadgehên meydanî û leşkerî de weke nûçegihan beşdarî kiriye, lê min qet tu kesek weke Qazî Mihemed biwêr û netirs nedîtiye. Wî di dema dadgehîkirinê de nedizanî tirs çî ye. Gelek mêrane û bêtirs qise dikir û bersîva pirsyaran dida."

Her ev netirsî û xwe gorîkirina wî jî bû ku li jêr darê îdamê rê neda çavên wî girê bidin û got: "Ez hez dikim di demên dawîn yên jiyana xwe de bi serbilindî û çavên vekirî binêrme welatê xwe yê ezîz û xweştevî." Her wiha emir kir:
"Hûn Qazî Mihemedekê dikujin, lê bizanin li her dilopeke xwîna min Qazî Mihemedek wê şîn bibe. Ez daxwazê ji gelê Kurd dikim dest ji xebata xwe di pêxema azadiya Kurdistanê de bernedin, baweriyê bi dewleta xwefiroş ya Tehranê nekin. Bijî Kurd û Kurdistan."

# Girtî bi darê zorê teslîm nedibûn



N: Bûbê Eser



Gardiyan:

"Roj bi roj şikil û metodên îşkenceyan zêde dibûn. Girtiyan bixwe nema dizanîbûn, êdî çi wê bê serê wan. Loma wan nema dikarîbûn, li hember îşkence û metodên nû, xwe hazir bikirana. Çi bihata pêşiya wan, ew mecbûrî bi wê razî dibûn. Me hingî metod û şiklê îşkencan peyde dikirin, em bi xwe jî aciz bûbûn, êdî em û yuzbaşiyê xwe gihîştibûn wê baweriyê ku kesên girtî bi darê zorê teslîm nabin. Tenê tiştek di destê me de mabû, ew jî ev bû ku em bikaribin bi darê zorê ji nava wan hin alîkarên xwe çêbikin.

Bi saya serê wan em kesên ku hîn li dijî me ne, yan jî kesên li dijî girtîgehê qise dikin û morala berxwedanê didin hevalên xwe, tespît bikin. Da ku em êdî li ser kesên weha rawestin. Ji ber vê bû ku êdî me ji bilî hin caran lêdana tevayî rakiribû. Her roj me hin kes ji qawişê derdixistin û lêdan li wan dikir ku em rewşa wan û cesareta wan a li hemberî lêdanê fêr bibin û pirsên li gor xwe ji wan bipirsin. Ev bûbû karê me yê rojane, bi dor, me hin kes derdixistin derve û pirs ji wan dikir ku bê rewşa kesên lêdan li wan dihate kirin çawaye? Ew ê bikaribin xwe li ber lêdanê rabigrin an na. Bi vê metodê, me gelek kes kirin alîkarên xwe.

Bi vê metodê êdî mirovên me, alîkarin me di qawişan de peyda dibûn. Bi saya serê wan, êdî me ew kesên hîn nehatibûn rê, û li dijî me qise dikirin, derdixistin derve û îşkence bi wan dikirin û ji wan re digot:

-Biner e, kurê min, derketin an jî mayîna te a li vir girêdayî rewşa te ye. Yuzbaşiyê me dikare kesan berde û bigire. Eger tu, daxwazên me bîne cih, tu dikarî di demekê kurt de ji vir azad bibe. Suçê te çi dibe bila bibe, berdan an jî mayîna te di destê yuzbaşî de ye.

Dema em ji wî re bêjin ku tu alîkariya me dike, wê ji îro pê de tu lêdan li te nahê kirin. Karê te wê tenê di hundirê qawişê de be. Tê guhdariya peyvên şexsan bike, bê ka ji hev re çi dibêjin. Eger hin kes li dijî me qise bikin, tê navê kesên weha bi dizî bide me. Pêwîst e ku girtiyên din ji rewşa te agahdar nebin. Em ê hewl bidin ku tu kes bi vê rewşa te nizanibin.

Ji du rojan carakê em ê banî te bikin û te derxin derve da ku tiştên li qawişê dibin, ji me re bêje. Dema vegerê tê bike axîn û ofîn weke ku me gelekî lêdan li te kiribe. Ji girtiyan re bêje "gardiyan ji bo lêdanê bangî min kir" bi vî awayî him tê ji lêdanê xilas bibe, him jî tê zû ji vir bê berdan.

Lê, eger tu tiştên rast nebêjî, tiştên ku wê werin serê te jî divê tu pê bizanibe. Bi vî awayî me hin kes bi dest xistin, hin kes jî qet nehatin rê, qasî ku me lêdaneke zor û giran li wan dikirin, dîsa kesên ji me re lazim û pir tişt dizanî bûn, tu tişt ji me re nedigotin.

Ew kesên bûn alîkarên me, ne ji wan kesên kurtçî û komunîst bûn. Ji xwe hinên din di qawişan de hebûn ku ew bi xwe dijminê komunîst û kurtçiyan bûn. Kesên weha dema dîtin, em xwedityê li wan dikin, gelek ji wan bi xwe hatin û digotin : "Ez dixwazim bi her awayî alîkariya we bikim". Erê me ew guhdarî dikirin, lê rûmeta kesên weha zêde tune bûn, dema karê yuzbaşî bi wan diqediya, êdî wî jî guh nedida wan.

Mirovên muxbîr zû dihatin nasîn, me nema dizanîbû ku çima ew weha zû têne nasîn ku ew bûne zilamên me. Em weha têgihiştin ku mirov nikare di nava kesên zana de, li dijî wan, demeke dûr û dirêj kar bike. Dema wan zilamê xwe yên muxbir nas dikirin, nikarîbûn tiştekî bi wî bikirana, ji ber wan dizanîbû ku ew kes ji terefê me de têne parastin.

Heta ez bi xwe li wê girtîgehê gardiyan bûm, min nedît ku rojekê ji rojan wan kesên girtî têr av vexwarin û xwarin xwarin, ji bilî wan kesên alîkariya me dikirin, yên din hemû tî û birçî bûn. Ew kesên girtî yên alîkariya me dikirin, rewşa wan gelekî baş bûn. Lê kesên di berxwe didan, rewşa wan jî gelek xerab bûn. Ji bilî van, girtiyên din hemû kêm zêde, mirov dikare bêje wek hev bûn. Ji bona wan serşûştin, kincşûştin hatibû jibîrkirin, me cihê xweşûştinê yanî ew hemama ku ji bo wan, hatibû çêkirin, kiribû cihê îşkencê.
Tenê dema hin heyet ji Ewropa, an hin kesên ku digotin em mafên mirovan diparêzin dihatin girtîgehê. Wê demê him hemam vedibû, him xwarineke xweş ji girtiyan re dihate çêkirin û belavkirin, ew jî tenê ji bo rojekê bû. Ji bona kesên ji Ewropa dihatin ku rewşa girtîgehê baş bibînin, ew xwarin û mesref dihat kirin. Lê piştî çûyîna wan, me him heqê xweşuştinê û him jî heqê xwarina xweş ji bêvila wan derdixist.

Niha jî ez dixwazim li ser rewşên weha, ji te re çend mînakan bidim.

Dema di medyaya Tirkiye de, di derheqê girtîgeha Diyarbekerê bi awayekê xerab piropaganda dihat kirin, wê demê yuzbaşiyê me ji bona ku wan tiştan bi awayekî nerast bide diyarkirinê, wî televizyon dawetî girtîgehê dikir û hemû filîmên girtiyan yên li gor dilê xwe me dida kişandin, li hember wan de, me ew didan weşandin. Roja wê Televizyon bihata, wê rojê me hemama girtîgehê dixiste halê xweşûştinê û dibû xuşe-xuşe ava germ û sar, te digot belkî ev hemama tucarî nebûye cihê lêdan û îşkencan.

Piştî me hemam hazir dikir, berê televizyon dibir wir. Ew hemama, ava germ û sar jê dihat, rê wan dida û wan jî film dikişandin. Dûre me çend qawiş dixistin rêzê ku werin serê xwe bişon, me girtî li qawişên wan tazî dikirin, tenê li ber wan de me derpê dihişt û taseke hamamê dixiste destekî wan, û destê din jî de xewliyên wan û bi terlikan me ew ji qawişên wan derxistin, di salona mezin de dibirin hemamê, televizyonciyên me jî filmê wan dikişandin. Fîlmkêş dîçûn hêleke din.

Dema ew diçûn me jî weke her tim dest bi hejmartinê dikir. Yeeek...diidooo... sisêêê, ji xwe kesî nikarîbû xwe di demeke ewqas kurt de bişûşta. Me jî nedixwest ku ew serên xwe bişon.

Bi vî awayî, him me li hember medyaya Tirkiyê û hin caran jî, li hember raya giştî ya dinyayê rûyê xwe spî dikir(!)..."

## Nerîna Lîderan



**Nêçîrvan Barzanî:**

**“Kurdistan û Êzidî tu cara ji hev nayên cudakirin”.**



**Mariya Zaxarova:**

**“Li Kendavê rewş xeter e û egera şer li wê deverê zêde dibe”.**



**Receb Teyîb Erdogan:**

**“Emê li dijî Rojhelata Furatê operasyonê dê encam bidin”.**



**“Mihemedcewad Zerîf”:**

**“Di New Yorkerê de bi min re gotin ku di heyama du heteyên bê de, yê te baykot bikin”.**

# Gelawêj bêhna Kurdan ji bo serxwebûnê fireh dike





**N: Eskender Ce`iferî**

Heyva Gelawêjê di nav hemû heyvên salê de ji bo Kurdan wateyeke taybet bi xwe re tîne. Gelawêj, tê wateya hewldan ji bo rizgarbûn ji tepisandinê. 25’ê Gelawêjê 74’emîn salvegera avakirina Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê ye. PDKÎ sala 1945’an li ser bingeha rêxistina Komeleya Jiyaneweya Kurd, (J.K) ku sê salan berî wê pêk hatibû, hate avakirin.

Niha jî Rasan bi hemû werz û dansalên xwe, rengê nîştimana Gelawêjê dide welatê me.

Beriya çend salan dema ku Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê behsa xebatê dikir, digot em niha di warê rêkxistinî û siyasî de xebatên xwe dimeşînin. Lê vê carê rewş cuda ye û ev çend sal in ew partî behseke cuda dike. Ew dibêje dibe ku rewş were guhertin û ji ber vê, em hêzên xwe dibin sînorên Kurdistana Rojhilat.

Piştî Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê, hin partiyên din ên Kurdistana Rojhilat jî hêzên xwe birin sînor. PDKÎ ku mîratgira Komara Kurdistanê ye, çendîn caran ragihandiye ku eger şer jî çê bibe, ew amade ne. Çendîn şehîd jî di pevçûnên xwe bi Sipaya Pasdaran re dane û gelek ziyan li Sipayê dane.

Navê pirojeya PDKÎ ku bêhna Gelawêjê lê tê, Rasan yan jî Rabûn e.

Gelawêj tenê ji bo Kurdan nayê wateya xebatê. Gelê Urogoyê yek ji wan gelan e ku di vê heyvê de serxwebûn ji xwe re bi dest xistiye. Ew sala 1825’an ji Birêzîlê cuda bûn. Neteweyeke din ku di vê heyvê de çarenivîsa xwe diyar kir, Bêlaros e ku sala 1991’an ji Yekîtiya Sovyetê veqetiya û serxwebûna xwe ragihand.

Dilê Kurdan jî bi Gelawêjê xweş e û ew ji bo ku bigihin Gelawêjeke azad, xebata xwe didomînin.

Ne PDKÎ û ne jî partiyên din ên Kurdistana Rojhilat, li bendê nîn in ku aliyên derve û welatên din, Îran û Kurdistanê ji bo wan rizgar bikin. Lê ew dizanin ku Donald Tramp serokkomarê Amerîkayê di kiryarên xwe de li hemberî Îranê xurt e. Li gor wan, Tramp weke Obama ji Îsraîl û Erebistanê naxwaze li hemberî Îranê nerm bin belkî wê lidij derkeve.

Hemû partiyên netewegir ên Rojhilat û di nav de jî Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê dibêjin Kurd neteweyek e û Kurdistan jî welatek e û divê partiyên Kurdî li ser bingeha berjewendiya netewî tevbigerin. Gelawêj, Pûşpera xembar a Dr. Qasimlo jî bîr nake, Xakelêwa Qazî û Payîza Şerefkendî jî ti caran ji bîr nake û lewma jî keç û xortên Kurd ref bi ref tevlî rêza xebatê dike û li hemberî desthilata tepisandibê û gemar a Komoara Îslamî perwerde dike.

Êdî ji bilî pêşmergeyan navbajar, endamên eşkere ên Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê li Herêma Kurdistanê jî, ji bo berxwedana çekdarî li hemberî rejîma meleyên Tehranê têne rahênan.

PDKÎ ku mîratgira Qazî Mihemed, Dr. Şerefkendî û Dr. Qasimlo ye, sala 2017’an ji bo cara yekemîn navê Pêşmergeyên Navbajêr bi kar anî. Ew jî, ji bilî wan hêzan e ku weke Bazên Zagrosê têne binavkirin û bi teknîkên xwe û bi riftar û kiryarên xwe dişibin vê partiyê û xelk jî, wan, ji vê partiyê cuda nabîne. Tevî ku PDKÎ berpirsyaretiya kiryarên wan nedaye ser xwe, lê Rasan bi hemû demsalên xwe, Pêşmergeyên Navbajêr, Pêşmergeyên Çiya, Bazên Zagrosê û… hemû di xizmeta Gelawêja 74 salan xebat û berxwedanê de ne û di pêxema pêşerojeke geş de ne.

Ne sêdareya Çarçirayê, ne terora Viyenê, ne terora Mîkonosê û ne jî şehîdkirina bi hezaran keç û xortên Kurd, nekarî bejna neteweya me li hemberî dagirkar bitewîne. Lê belê xebata wan ji berê germtir û xurttir bûye û bi tîrêjên welatê agir û rojê, sibeh û şevê, dilê ciwanan ji bo evîna welat dinexşîne.

Kevnartirîn partiya Kurdî ku bi awayekî rêkxistinî, di qonaxên cuda de ji serdema Komara Kurdistanê ve li ser piyan sekinî, bi xebata veşartî di serdema Pehlewiyan de û bi xebata eşkere a bi destê Dr. Qasimlo, nîşan da ku modernîzebûn, tenê ev nîn e ku berên xwe bidin welatên rojava û her tişta ku ew bikin, em jî bikin. Bê guman PDKÎ nîşan daye ku dilê Gelawêj û Gelawêjdostan nahêle û bi dahênanên nû ên weke Rasanê, wê ji bo dabînkirina mafên netewî û demokratîk û modern ên Kurdan, di kar û xebata xwe de berdewam be.

# PDKÎ li ser koka demokrasiyê şîn bûye



N:Cemal Fethî

Gelawêj ku di Kurdewarî de wekî mehekê hatiye pênasekirin ku têhn û gurriya germayê rû li daketinê dike, û hêdî-hêdî rewşa hewayê ber bi hênikatiyê ve diçe, di dîroka şores a azadîxwaziyê û kurdatiyê de jî beşeke dîrokê ji xwe re misoger kiriye, û bûye xala destpêka cureyeke din ji şoresê û di rastî de xala guhertinê de şêwaza xwestek û daxwaziyên neteweya Kurd de.

Di dawiya vê mehê de, (Gelawêja sala 1324) paş derbazbûna sê salan piştî avakirina Komeleya J-K avakerên vê rêkxirawa siyasî ya Kurd biryar dan ku şêwaz û pêkhate û heta navê rêkxirawê jî biguherin bo naveke din, û bi şêwazeke din di pêxema bidestxistina mafên rewa ên neteweya Kurd xebat û tekoşîna xwe bidomînin, eva bû ku rast li 25-ê Gelawêjê a 1324 a Rojî wate rast di vê rojê de ku Komeleya J-K hate avakirin, avakirina hizbekê bi navê Hizba Demokrat hate ragehandin û qonaxeke din ji




xebata neteweyî a Kurd dest pê kir.
Xalek ku ew hizba ji Komleya J-K û heta ji şoreşên berî xwe cuda dike, ew bû ku PDKÎ bi programeke serdemiyane û biroj hate nava leyîzên siyasî ên herêm û Kurdistanê, lewra nêzî şeş mehan paş avakirina vê rêkxirawê, yekem kiyana Kurdî bi navê Komara Kurdistanê di 2-ê Rêbendanê ya heman salê de hate avakirin, ku xwediyê ala û sirûd û dirav û spaha neteweyî û serkomar û kabîneya wezîran bû.

Bona nirxandina her rûdaweke dîrokî, yan her qonaxeke dîrokê dibe awirekê li rewşa siyasî, civakî, ferhengî û aborî ên vê serdemê bidin, û sedem û hokaran li ber çav bigrin, heta asta vê qonaxê derbikeve, û dewr û rola wê di dîroka siyasî û civakî a civakê çi li wê serdemê û çi jî piştre xwe nîşan bide, heta eva ku hem li ezmûnên tal û baş ên xwe bona birêvebirina îdareya civakê bi kar bîne.

Avakirina PDKÎ ku wek yekemîn hizba modern a Kurdî tê hesibandin, li ber vê ku wêjman û dîskorsa wê bi şêwazeke din ji şêwazên berî xwe anîbû holê, wate stratejiya xebata vê hizbê her wekî pêştir rizgariya neteweya Kurd ji bindestî û pêkanîna kiyanekê bo serbestiya takê Kurd bû, lê ew serbestiya ji dîtingeha PDKÎ ve wata û pênaseyeke din hebûye û heye, û di civaka serbestî ya PDKÎ de take Kurd dikare bi her boçûneke takekesî ve bijî, lê serbestiyek ku her di asta ser heya asta xwar a civakê de yekdest û yekreng be. Di serbestiya PDKÎ de berpirsayetî a PDKÎ bi wateya destêwerdan û kuştin û birînê nine, belku bi wateya zêdetir xizmetkirin û zêdetir xwe mandîkirinê ye, bi kêşe û arîşeyên civakê ve, her ew xal bû sedema vê ku bîrokeya şovenîstî û dîktatoriyetê di nav vê hizbê de nekare geşe bike û hekî jî hebe, temenê wê kurt be.

Yekek din ji wêjmanên PDKÎ ku bo yekem car hate nava edebiyata siyasî ya Kurd de, wêjmana demokrasiyê bû, wate xebata PDKÎ tenê bo rizgariya ji dest neyar û dagîrker niye, belku xebata PDKÎ bo rizgariya ji dest her cure çewsandin û cudahîdanînekê ye, îca ew cudahîdanîn ji aliyê deshilatdareke neyar ve be, yan ji aliyê deshilatdareke xwexweyî ve, tu cudahiyeke wê nine.

Koma van taybetmendiyan wisa kiriye ku PDKÎ ku 74 sal in di qada xebata Kurd de maye, di pêxema mafên rewa ên neteweya Kurd de ji berê biemegtir û bibawertir pêngavan bavêje, bi awayekî ku xwestekên siyasî ên neteweya Kurd bigehîne navendên deshilatdariya Îranê, ku pêgeh û asta Kurd wek neteweyekê biparêze.

# Roja Nîştimanî ya Kurdan di Gelawêjê de derdikeve

**Bo carek din, niştiman bi rengê Gelawêjê dixemile û rêvîngên mekteba Çarçira, yada 74 salî a xebata Partiya Demokrat zîndî radigrin.**

Li gorî nûçeya ku gihîştiye malpera "Kurdistanmedia"yê, endam û alîgirên PDKÎ, bi hilkevta 74`emîn salvegera avakirina Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê, li bajarên Rojhilatê Kurdistanê, çalakiyên banghêjî lidar xistin.

Di vê pêwendiyê de, emegnasên Demokrat, roja Şemî 12`ê Gelawêjê, bi ladar xistina çalakiyên banghêjî û nivîsîna silogan li gundê "Gunbed" a girêdayî devera Somaûbiradust a ser bi bajarê Urmiyê, piştevaniyên xwe li xebata Demokrat nîşan dan.

Siloganên wê çalakiyê wiha ne,"bijî Demokrat, bijî Qasimlo, rêya şehîdan dom heye, Partiya Demokrat fêrgeha berevanî û şoreşê ye".

Herwisa xurtên Demokrat li cihekî bi navê "Qemçî Şerîf", li gundê "Gelînî" a girêdayî devera Jawero a ser bi bajarê Sine, bi lidar xistina çalakiyên banghêjî û bi nivîsîna



silogan, tîrêjek li hetaw a xebata Demokratan di Gelawêjê de, xiste nav dilê azadîxwazan.

Siloganên wê çalakiyê wiha ne: "Bijî PDKÎ, bijî Qasimlo, bijî Demokrat".

## Pênc sal bi ser komkujiya Kurdên Êzîdî re derbas dibe

**Pênc sal berî niha di 3`ê tebaxa 2014`an de, hezaran Kurdên Êzîdî ji aliyê girûpa terorîst a DAÎŞê ve hatine kuştin û aware bûn.**

Îro pêncimîn sale ku bi ser enfal kirina Kurdên Êzîdî ve derbas dibe, û di 3`ê Tebaxa 2014`an de, DAIŞê êrîş kire ser Şengalê û derdora wî, û hezaran Kurdên Êzîd hatine enfalkirin û hezaran keç û xurtên Kurd ên Êzîdî jî, ji aliyên terorîstên DAÎŞê ve hatine revandin.
Ofîsa rizgarkirina Kurdên Êzidî yên revandî, Hisên Koro Qayidî ragihandiye ke: Hezaran Kurdên Êzîdî aware û nexuya ne û hejmara ku yekim roj ku DAÎŞa terorîst êrîş kire ser Şengalê, 1 hezar û 293 kes hatine enfal kirin û heya niha 80 goristanên bi kom jî hatine dîtin.

Şerê DAÎŞê, bilî awarekirina



hezaran Kurdên Êzîdî li pey xwe hebû, bûye sedema wê yekê ku, 100 hezar Kurdên Êzîdî bo derveyê welat biçin û bibine penahende.

Heya niha jî hejmareke zêde a Kurdên Êzîdî bi sedema herifîna avahiyên wan û ji tirsa hebûna girûpa terorîs a DAÎŞê ve, neçaran di nav kempan de bijîn.

Dawiya sala 2015`an Şengal ji aliyê Hêzên Pêşmergên herêma Kurdistanê ve bi piştevaniyan balafirên hevlbendiya navneteweyî ve hate kontirolkirin.

## Keç û xortekî ciwan ên bajarê Serdeştê, dawî bi jiyana xwe anîn



**Keç û xortekî ciwan ên xelkên bajarê Serdeştê, bi sedemekî nexûya dawî bi jiyana xwe anîn.**

Li gorî nûçeya ku gihîştiye Ajansa Nûçegihaniya "Kurdpa"yê, êvareya roja Duşemî 31`ê Pûşperê, keçeke temen 18 sale ya bi navê "Sirwe Îbrahîmî" xelkê bajarê Serdeştê, dawî bi jiyana xwe anî.

Ew keça ciwane, rûniştiyê "Gereka ŞêxeSor" a girêdayê bajarê Serdeştê bûye, ji aliyek din ve jî, xurtekî temen 24 salî ê bi navê "Siyaweş Ezîzî" dawî bi jiyana xwe anî.

Heya dema belavbûna vî nûçeyê, tu zanyariyeke hûrd û dirust ji derheq xwekujiya wan Du ciwanên Serdeştê, ji ber dest nîne.

Bajarê Serdeştê yek ji bajarên parêzgeha Urmiyê ye ku zêdetirîn xwekujî têde diqevime û li pileya yekem a xwekujiyê di wî parêzgehê de ye.

## Keçeke 20 salî hate destbiserkirin



**Keçeke temen kêm a xelka bajarê Pîranşarê ji aliyê hêzên îtila`atê ve hate desteserkirin û bo girtîgeha bajarê Urmiyê hate veguhastin.**

Li gorî nûçeya ku gihîştiye Ajansa Nûçegihaniya "Kurdpa"yê, keçeke temen kêm a bi navê "Dinya Şalî" a temen 20 sale û keça Hisên a xelkê gundê "Gezgesk a Pîranan" a girêdayî bajrê Pîranşarê, ji aliyê hizên îtila`atê ve hate desteserkirn.

Ew welatiya Kurde piştî ku ji aliyê hêzên îtila`atê yên hikûmetê ve hate desteserkirin, bo girtîgeha îdareya îtila`at a bajarê Urmiyê, hate veguhastin.

Heya niha malbata wê keçê bo şopandina qedera keça xwe bê encam mane û hêzên îtila`atê îzna hevdîtinê ji malbata wê re nedane


Heya belavbûna wî nûçeyê, îdareya îtila`atê, tu sebebeke bi merema desteserkirina wê keçê nedaye xûyakirin.

## Çalakvaneke Kurd hate destbiserkirin

**Çalakvaneke kurd ê xelkê bajarê Merîwanê, ji aliyê hêzên Îtla`atê ve hate desteserkirin.**

Li gorî rapora ku gehiştiye Ajansa Nûçegihaniya "Kurdpa"yê, roja Şemî 5`ê Gelawêjê, hêzên Îtla`atê bi êrişkirin liser mala çalakvaneke medenî a kurd, ya bi navê "Perwîn Edwayî", û navbirî desteserkirin.

Hêzên îtla`atê piştî vekolîna mala wê, ew çalakvana medenî bo ciheke nexûya veguhastin.



Perwîn Edwayî, di heyama çend salên derbasbûyî de, di biyavî jinan û zarokan û jîngehparêzî li bajarê Merîwanê de, çalakî hebûye.
Ji aliyekê din ve "Cehfer Pekend" welatiyê bajarê Bokanê di girtêgeha îdareya îtla`ata bajarê Urmiyê de, di jêr lêkolînê de ye.
Ew welatiyê kurd, roja 19`ê Pûşperê, ji aliyê hêzên îtla`atê ve, bi tohmeta alîkarîkirin di gel yek ji Hizbên Kurdî yên opozisiyon ên hikûmeta Îranê" hate desteserkirin.

Her di vê pêwendiyê de jî, "Şapûr Sofîzade" welatiyê kurd ê xelkê bajarê Urmiyê, bi tohmeta alîkarîkirin digel yek ji Hizbên Kurd ên opozisiyon ên hikûmeta Îranê, roja 9`ê Pûşpera îsal, ji aliyê hêzên îtla`ata Spaha pasdaran ve hate desteserkirin.

Roja Duşemî, 7`ê Gelawêjê, di girtîgeha îtla`ata Spaha Pasdaran de, li bingeha "El-Mehdî" a bajarê Urmiyê, bo girtîgeha navendî ya wî bajarî hate veguhastin.

# 22 sal e cihê vala yê wergêrê navdar ê Kurd her xuya ye

**Bîst û du sal berî niha di rojekî wiha de, wergêrê navdarê Kurd, bo hertimî malavayî li dinyaya nivîsîn û wergêraniyî kir û pênûsa wî her maye.**

Neveke xuya û dîrokekî zêrîn li dîroka navdarên Kurdî li warê nivîsîn û wergêran, "Mihemed Îmamî Qazî", naskirî bi "Mihemed Qazî", 22 sal berî niha û di sala 1376`an de, di temenê 84 salî de, bi hertimî pênûsa xwe bo hogirên wêjeyiyê spart û malavayî li dinyaya nivîsîn û jiyana pir berhema xwe kir û bû bi cawdan di dîrokê de.

"MIhemed Qazî" 12`ê Gelawêja 1292 (3`ê Tebaxa 1913`an), li bajarê Mehabad a Rojhilatê Kurdistanê ji-dayîk bû.

Navbirî ji aliyê mamostayekî Mokriyanî ve hînê zimanê Firansayî bibû, û piştre bo xwindinê rû li bajarê Tahranê kir, û piraniya jiyana xwe di wî bajarî de derbas kir.

Navbirî piştî ku rastî nesaxiya şêrpenceya gewrî hat, bû çareseriyê rû li welatê Almaniya kir.

"Mihemed Qazî" di warê nivîsîn û wergêranî û herwisa nivîsîna helbest de kar dikir û xwedê pênûseke bihêz bû.

Li binavûbangtirîn berhemên wî, dikarin amaje bi romana "Don Kîşote" bikin, ku xelata baştirîn wergêra salên 1336 û 1337 `an vergirt.



"Mihemed Qazî" xwedê 64 berhemên wergêrê ku, li sala 1319 û 1373`an hatibûne çapkirin, û herwisa xwedê 3 berheman li nivîsîna xwe ye.

"Mihemed Qazî" li sala 1376`an di temenê 84 salî de, li nexweşxaneya "Îran Mêhir", li bajarê Tahranê koça dawiyê kir û piştre termê navbirî li nav girseya wî û li goristana "Budax Sultan", bi axê hate spartin.

# Pirtûka rastiyên Efrînê hate çapkirin

**Pirtûka "Rastiyên Efrîn"ê bo cara yekê hate çap û belavkirin, û di pêşangeha Qamişloyê de hate pêşandan.**

Di Rojavaya Kurdistanê de "Xelîl Mûsa", nûciwanek 14 salî yê xelkê Efrînê, pirtûkek bi navê "Rastiyên Efrîn"ê li derheq wî bajarî dinivîse.

Ew pirtûke bas ji 3 qonaxên bajarê Efrînê dike û di yekek ji pêşangehên pirtûkan di Qamişloyê de anîne ber dîda xwendevanan.

Nivîser di wê pirtûkê de, bas qonaxên pêş şer, dema şer û piştî şer ku Tirkiye Efrînê dagîr kir, dike.

"Xelîl Mûsa" ê 14 salî, nivîserê pirtûka "Rastiyên Efrîn"ê, hizir û gotinên wî ji temenê wî mezintir in.

Navbirî di derheq wê pirtûkê de gotiye: "Di wê pirtûkê de min basa xwezaya Efrînê ber ji rûdana şer kiriye, ku min têde îşare bi dewlemendî, jiyan û dîroka Efrînê kiriye, û herwisa min basa rewşa kuştina zarokan di dema şer de kiriye ku çawa dihatin kuştin".
Ew nivîsere, kêm tementirîn nivîserê yekîtiya nivîskarên Efrînê û pişkdarê pêşangeha pirtûka Qamişloyê ye.

Ew nivîsere, çîroka tirajêdiyên Efrînê û dorpêçkirina Efrînê ji aliyê Tirkiyê ve bas dike û dibêje: "58 rojan bi balafiran û hemû core çekan, êrîşê kirine ser Efrînê, û tu welat û kesek ji derhq wê zulmê ve nehate ziman".



Xelîl, di pola 9 a seretayî de dixwîne û di temenê 11 saliya xwede dest bi nivîsandina helbest û çîrokan kiriye.

# Cihên dîrokî yên Kurdistanê ji nav diçin

**Karwanseraya Şa Ebas li bajarê Qesra şîrîn, li dema bûyera erdhejê di parêzgeha Kirmaşanê de, ziyaneke zêde berket û heya niha nehatiye çê kirin.**

Karwanseraya Şa Ebas, li bajarê "Qesra Şîrîn" a girêdayê parêzgeha Kirmanşanê ye, û yekek ji cihê dîrokî yê wê deverê tê hejmar, ku li dema bûyera erdheja Dul sal a berê niha ya parêzgeha Kirmaşanê, ziyaneke berçav lê ketiye û gefa jinavçûnê li serê ye.

Ew karwanseraye, ku li navenda bajarê Qesra Şîrîn hilketiye û rojane dehan kes û geştiyar serdan dikin û wekî bazareke biçûk lê hatiye.

Heya niha berpirsên rejîmê tu girîngiyek nedane wê cihê dîrokî û heta di rêzbenda avadankirina de jî nîne.

Di dema erdheja Kirmaşanê de, Karwanseraya Şa Ebasî, Kela Yezdgir li bajarê Dalahû û Zîc Minîje li Serpêl a Zehaw, bi sedema erdhejê ziyan ber ketine.



Ew cihên dîrokî bi sedema guh nedana perpirsên rejîmê jinav diçin.

# Zimanê Kurdî

Ev peyva lêkdayî jî, bi wateya cihekî nêz (vî rexî) tê xebitandin .
b- peyva (wiyalî) jî, ji (wî aliyî) hatiye pevxistin. Ev peyva lêkdayî jî, bi wateya cihekî dûr (wî rexî) bikar tê .

9- Vir (vira) : Ev bêje bi wateya (vê derê, vî cihî) bikar tê . Li herêma Behdînan jî ev gotin bi raweya (vêrê) tê xebitandin û di kurmanciya xwarê (Soranî) de jî bi raweya (êre) tê xebitandin . Ev her sê gotin jî (vir, vêrê, êre) wateya cîhekî nêzîk didin. Dema ku em wan her sê gotinan di ber çavên xwe re derbas bikin û wan beranberî hev bikin em ê bighêjin encamekê, ku bêjeya (vir) bêjeyeke lêkdayî ye, ji gotina (vê derê) kurtebirr bûye û hêj bi wateya cihê nêz tê xebitandin.

Wek :

- Vir (vê derê) ji her derê xweştir e
- Hevalên min çûn û ez li vir mam . - Ji bo karekî giring ez hatime vir .

Bi dîtina min, kurtebirrî û pevxistina (vir) bi vî şêweyê jêrîn, ji (vê derê) hatiye : 1- Kîta (de) ji (derê) hatiye avêtin :

- Vê + ...rê = vêrê . (Wisan jî li herêma Behdînan bikar tê .
2- Nîşandeka verêsê (ê) ji (derê,...rê) ketiye

- Vê + ...r = vêr .
3- Tîpa (ê) ji cînavê nîşandan (vê), bi egera

sivikbûnê, bûye (i) :
- Vêr = vir
( Bi wê pîvan û rêbazê jî bêjeya (kur) ji gotina (kû derê) hatiye sivikirin û pevxistin : 1- Kîta (de) ji (derê) hatiye avêtin : - kû + ...rê = kûrê .

2- Nîşandeka verêsê (ê) ji dawiya (kûrê) ketiye :
- Kûr... = kûr .
3- Tîpa (û), ji cînavê pirsiyarî (kû), bi egera sivikbûnê, bûye (u) :
- Kûr = kur .
Wek :

- Ev cihê ha kur e (kû der e) ?
- Tu ji kur î (kû derê yî) ? - Ka em ê biçin kur (kû derê) ?

Têbînî : Hindek caran gotina (vir) bi şêweyê (vira) jî bikar tê. Gotina (vira) ji (vira ha) sivik bûye. Koka gotinê jî ev e: (vê dera ha) Wek :

- Ez li vir im = Ez li vira me
= Ez li vira ha me . = Ez li vê dera ha me .

10- Wir (Wira) :

Çawa bêjeya (vir) ji (vê derê) sivik û kurtebirr bûye wisan jî bêjeya (wir) ji gotina (wê derê) hatiye kurtkirin û pevxistî .
Ev bêje bi wateya cihekî dûr tê xebitandin.
Wek :

- Ku tu çûyî Amedê, li wir (wê derê) bimîne .
- Memo ji Silêmaniyê hat, gelo çi li wir (wê derê) dît ?
- Ez li vir im û tu li wir î .

Li herêma Behdînan (wêrê) li şûna (wir) bikar tê . Ew jî, ji (wê derê) sivik bûye . Bêjeya (wir), di nav gel de, bi şêweyê (wira) jî bikar tê. Ev şêwe ji (wê dera ha) kurtebirr bûye. Anku :

- Wir : Wê derê
- Wira : wê dera ha .
11- Vêde :

Bêjeya (vêde) bêjeyeke lêkdayî ye, bi şêweyekî gelêrî ji cînavê nîşandan (vê)( ) û bêjeya (derê) kurtebirr û sivik bûye .
Ev kurtebirrî û pevxistin jî,bi vî şêweyî pêk Hatiye:
- Kîta (rê) ji gotina (derê) hatiye avêtin - Vê de... = vê..de . - Cînavê nîşandan (vê) û (de) ya ku ji (derê) maye, her dû hatine pevxistin : - Vê + de = vêde Ev bêjeya kurtebirr û pevxistî (vêde) bi wateya cihekî nêzîk bikar tê . Wek :

- Were vêde (vê derê), em te bibînin !
- Ez ji vêde (vê derê) mişext nabim .
- Axa vêde (vê derê) têr û zengîn e .
12-Evde : Ev gotin jî lêkdayî ye, ji cînavê nîşandan, yê raweya rasteder (bê verês) (ev) û gotina (der) sivik bûye : - Tîpa (r) ji gotina (der) hatiye avêtin : - Ev de... = Ev de - Cînavê (ev) û (de) ya (der) hatine pevxistin : - Ev + de = Evde .
**Dom heye...**

# Agirî

- Rojnameya “Agirî” di van malperên jêrên de bixwînin:
- www.Kurdistanmedia.com
- www.Agirimedia.org
- rojnamaagiri@gmail.com
- www.facebook.com/Agirikirmanji

Navnîşana derveyî welat: AFKB.P. 102- 75623 ParisCEDEX 13 –FRANCE E - Mail: Agiri2003@gmail.com Hejmar (355)


## Wêneyên bidawîhatina dewreya perwerdehiyê ya endamên Rêkxistina Eşkere a PDKÎ



















